

Parastina Zaravayên

Kurdi

Riza Çolpan ê Dêrsimî

Ji hemû xwendevanên kovara Pirsê û Rojnameya Newroz ê re “Roj baş, dema we xweş birayên xoşewîst” dibêjim û destpêka nivîsa xwe dikim.

Adar e, Bi Êş û Jan
Him Cejn e, Him
Dîlan e

Dema we bi xêr, roj
baş xwendevanên

hêja. Gelek wext e ku

min jî dev ji nivîsîna zimanê xwe yê zikmakî berdabû. Hecku min dixwast herdem qasî zanîna xwe, ez bi zimanê dayîka xwe hin tiştan binivîsînim, lê sed mixab û sed heyf e ku xwendevanên zimanê dayîkê gelek kêmin. Ji ber vê yekê jî mirov carna bêgav dimîne û zimanê ku dijminê xwînxwar bidara zorê ji gelê me yê kesîb daye fêrkin, wî zimanî dinivîsîne.

Ji bo vê jî daxwazî û mabest dîyar e, ez bawer im her kes dizane. Ango gelê me bi zimanê xwe yê zikmakî ve nehatîye perwerdekirin. Nêzî sed sal e ku zimanê dayîka me hatiye qedexekirin, gelê me bi zimanê dijminekî zalim ve tê perwerdekirin û tê xapandin. Ji ber vê yekê jî hemû nivîskarên Kurd, -Kurdên bakurê Kurdistan- bi pîranî bêgav dimînin û bi zimanê dijmin dinivîsînin, dixwazin bi vî zimanî peyamên xwe bigîhîjînin gelê xwe. Di vê gelşê de nivîskarên bakurê Kurdistan çiqas bi heq in, ez wê jî ji we xwendevanan re dihêlim. Herwaha xwendevanên xoşewîst, ez vê gelşê dirêj nekim, werim ser gelşa binyat, ango asas. Ji ber ku li jor sernivîs bi navê meha Adarê destpêbûye. Min gotiye “Adar e, bi êş û jan e, him cejn e, him dîlan e”. Bi rastî jî wisa ye, ne wisa?

Gelo meha Adarê çira ji me Kurdan re him bi êş û jan e, him jî cenj û dîlan e? Niha bi destûra we ez dixwazim werim ser pîrsa vê gelşê û mîjarê.



Çawa ku hûn jî dizanin, bav û kalên me ji me re: “Meha Adarê, mizgîna destpêka biharê ye gotine. Li ser deşt û çiyay, kaş, tap û zinarên Kurdistan barana berfê kêmin dibe. Dar û ber hêdî-hêdî di bin berfa sar û qemir de derdikevin, di gelek ciyan de, dar bişku didin, şilî û şepelî berfê dihelîne, xweza tê guhartin. Hin kal û pîrên gundê me, di heft, neh, hivdeh û bîst û yekê vê mehê de rojî digirtin. “Rojî digirtin” dibêjim, lê şeşt sal berê, niha nizamim. Ji ber ku diya min a dilovan hersal, di van herçar rojan de rojî digirt, lê ji bo çi bû nizamim”. Diya min digot “Va her çar rojana ,rojên pîroz in”, lê pîrozbûna van rojan li ku dihat min jê pîrs nekir. Ji ber ku ez zarok bûm, pîrskirin nedihat hişê min, heya roja mirina wê jî min jê pîrs nekir. Tiştê ku tê bîra min, hemû kal û pîran bi taybetî ji bo roja bîst û yekê Adarê “Îro roja nû ye, sersal e, ji me re wek cejn e. Ji ber ku di vê rojê de sêla sor, ango sêla germ dikeve binê erdê, erdê germ dike, ax berfê dimêje, bi hemû nebatên xweza ve avis dibe. Heman wek dayîkek çito ku di zarok de ducan dibe” digotin. Bi rastî jî wisa ye. Li Kurdistanê -dîsa bi taybetî jî, ez ji bo Kurdistana Bakur dibêjim- di vê mehê de rewş bi tevahî tê guhartin. Mî, bizin, çêlek dizên, kalandina berx û karikan, mûr e mûra golikan ji gel re dibe awaz û melodyek xweş. Dew, mast û rûn zêde dibin. Cotkar, nîr, hevcar û gîsinên xwe jibo cotê Biharê amade dikin, kebanîyên malan “Buhar e, Adar e, dew li dar e dibêjin, hewa ne pîr germ, ne pîr sar e, li bin çêlekê golik, li bin miyê berx, li bin **D.R (11)**